Helbest, felsefe û mirov

Tirîfe Doskî

Nivîsîn li ser edebiyata bi giştî bi guman nabêjim karek zehmete ji ber edeb wek çi warên dî nîne û taybet helbestî cihê xwe yê taybet heye û çi curên dî yên edebiyatê neşên cihê helbestê bigirin. Helbest, duniya xwe ya taybet heye û hizra xwe û felsefe û zimanê xwe heye û edeb ne tiştek berceste ye, her kes dişêt li ser binivîse, her dem edeb mirovî dêxite ber pirsiyaran li ser bûyerî. Nivîser anku edîb dikevite milmilanê li gel xwe û pirsa xwe di mejiyê mirovî da dihelavêjin bi taybet li ser pirsek giring ew jî ew e, aya edeb dişêt edebek rasteqîne be beramber rûdanan yan mirovî dî her êxte ber gumanan?

Aya edeb bo xwe li ser ketwarî daxivit yan ketwarekê taybet dirust dike?

Edebî rasteqîne ew e xwe biselmîne merc nîne helgirê peyamekê be ji ber edebî cîhana xwe ya taybet heye, bêhna xwe û rengê xwe û rêkên xwe hene edebî çend xesletên taybet hene yek ji wan xesletên herî xweş ku di hemû kawdana de xweş û nexweş û reş û sipî û di her

HELBEST

demekê de xwe nişanî mirovî dide, lê bi yasa xwe û edaleta xwe û ciwaniya xwe, xesletik din ku edeb dişêt ketwarekî biguhore û ser ji nû ve ava bike li ser binyatekê hunerî, ebistimî, felsefî û zimanî, ne ku nivîser tinê tê de layenek serbixweye ku tenha li ser gêwlê û şêwey derbirîna wî nîne belku li ser nexşek ku tê de ziman deng û hizir jî cihî xwe dibînin edeb bihayeka aşkera xwe heye diyare û armancên edebî cudane di gel armancên warên din, ne heman armancên felsefî, derunnasî, sosyolojî û ayîn ne taybetmendiya nivîsîna edebî ew e dişêt me bicolîne wek hizir û soz pêk ve û karîgeriyek diyar li ser derunê nivîserî dike li hemû warên din, gotarên xwe hene li çarçûveyê (tîrmonolojî) xwe da li barî ketwarî tenha edeb rastiyeka ciwantir û fantaziyek qeşengtir bû biwêrî hey ava bike, edeb li gel warên din wek ayîn û sosyolojî û siyaset cudaye, tenha li gel babetên felsefî çend pêk ve çûn heye û bi taybet helbest û felsefe.

Helbest di nava felsefî ra dihête dîtin û dişên helbestê damêza felsefê da bînîn wek çewa helbest di nav peykerekî yan tabloyekî de dihê xwendin, wisa felsefe dihê dîtin, têkeliyeka nediyar heye di navbera hizir û rayên fîlosofan de derbarî helbest û felsefê, heger "Hîgil û Eflatun" î wergirîn bo nimune wek du navbang di warê felsefê de, lê hevdijatî di boçûnên wan de heye. Ku (Eflatun wesa dibîne helbest çi wate nîne û helbestvan ji dewleta îdealiyê dike der û rolê wan bi kêm dizanit), lê Hîgil cudayî dima dete xûyakirin ku "felsefe diviya cihî bo edebî hebe" Eflatun dibîne helbest wek janrawekî edebê zarvekirine ku wêneyeka narast û şêwazekî dor ji rastî berçav dike. Ku dûr e ji cîhana rast û orgînal Eflatun giringiyê dide bi ebstim û zanînê û fantaziyayê dûr dike, her wesa tiştek din heye di vêre de kêşa zimanî jî heye ku zimanê helbestî nabe zimanek felsefî û jênder bo zanînê û zimanê felsefê mirovî digehîne rastiyê lê zimanek helbestî nabe, herdu, helbest û felsefe di pantaya zimanî de hevnasname nînin, pirsyarên felsefê kunkirîtî û wênegiranene, lê bên edebî û helbestî xulqandina diniyayek eltirinatîve, xesleta serekî yaedebî ew e keşifa tiştê nenaskirî bike. Fîlosofê Ludîvî Vîtgniştayin dibêje; "ew tiştê neşiy li barê wî biaxivî pêwîst e li ser bêdeng bê", lê helbest bêhna sinora dibezîne û dişkêne û rêka dixulqîne

HELBEST

helbest li barî wan tişta dişêt bibêje yên nahên gotin. Li vêre eger tenha ziman cudabûna wî heye li gel felsefê pa aya zimanê edebî zimanek azad e?

Nivîserê edebî di herêmeka zimanî ya azad de dijî û ew peyvên ku cografiya xwe heye û cihê wan û karê wan diyar e tenha edeb dişêt teknîka karê wan bigihure wan cihên girtî ewa li ber peyvan tenha edeb vedike ber bi heman cîhana heyî, lê bi şêwek edebiyane, li vêre ziman jî dihête koylekirin. Cîhana zimanî di edebî jî de ji ber çend egerekên civakî, ramyarî û ayînî nasnama xwe ya zimanî ji dest dide û remziyeteka lawaza dibe nûnera hindek peyvên bi hêz di edebî de gazî kirin bo xweziyên nehêne gotin bo tiştên kip û lal û li bin tirsê hatine koylekirin û ciwaniya edebî jî di vê de heye ku hemû nihêniya aşkera neke û firerehende ew nivîsîna takerehend be taybemendiya xwe ji dest dide. Edeb her dem berhemhînane ji tirsekê ber bi azadiyekê diçe bo xweşiyekî bo hezên mirovan, karîgeriya edebî li ser nivîsera bûye û barê wan sivik kiriye wek derbirîn û edeb bi dirêjahiya mîjûya xwe bengawazek bûye bo gihurînê. Edeb bi hemû berhemhînana xwe û cîhana xwe û derdeseriya xwe bûye qurban û keftiye di metirsiya de ji layenên rewşenbîriya komelî û layenên ayînî û siyasî jî bê behr nebûyine ji tumetbarankirina edebî û karê edebî pir zehmete, lê nivîsîn karekî çinku zehmete lewma xweşe û romanivîs Luranis Darîl dibêje, "xelk dinivîse ji ber pêdiviye binivîsin û di wê bawerê de ye nivîsîn mirovî ber bi mirovbûnê dibe, dest berdan ji nivîsînê, ji ber her hoyekê hebe, dest berdane ji mirovatiya mirovî û çêkirina naxekî wêran û valaye", nivîsîn her çi be helbest yan çîrok yan roman be, cîhaneka altirinatîv dide me, cîhaneka xulqênere, lê eger edebê helbestî wergirîn, dê bi gotina Şekspîr destpêkem:

"Çavên helbestvana bi dînatî û ciwanî seh diken.
Ji esmanî ta erdî dibînin ji erdî ta asmanî."

Li vêre xeyal berceste dibe, hemû ew tiştên li erdî heyî bi çavekî dibîne û ji esmanî bo xwarê ev sihir û fentaziya heyî tinê di helbestê da heye û mêşkê helbestvanan eger yê berçav ba da birisqit ji tiştên ciwan û nazik, lê pirs eve ye helbest çî ye?

Renge her kes bişêt li gor têgehiştina xwe bo helbestê pênaseka cuda li gel kesekê dî çêbike. Helbest serederiye li gel babet bûyer û çemk û hebûnê dike, helbest ji kakilka babetan nêzîk dibe û rastiya babetan bi şêwekî teknîkî, hunerî û hizirî di formeka helbestî ya taybet ku

HELBEST

nêzîke bo rastiya mirovî, helbest gumanan bo mirovî çê dike, cîhana helbestî ji cîhanên din cudaye wek hizir û teknîka nivîsînê, fantaziya û ziman digehine pilên bilind di ruha têkistan de û rehendên cuda cuda dide mirovî, helbest geriyaneke di ruha mirovî ya tarî de û her kes neşêt bigehitî û destketê.

Helbest zimanî ji koyletiyê azad dike û ferhenga girtî vedike, bo çûna nav herêmeka azad bê wîstgeh, bê desthelat, bê pirs herêmek xewna berdiwam ber bi derazînka rastiyê bibe, helbest mirovî ber bi statîka ciwaniyê û mirovatiyê dibe.

Mirovayetiya helbest û helbestvanî:

Li ser mirovayetiya helbestê û nivîsîn bo mirovî, renge zor kesan li ser nivîsiye û ji wana huşeng di pertuka xwe de (derçûn ji desthelata manan) basê mirovî kiriye, aya ta çi rade helbestvan bo mirovatiya mirovî helbestê dinivîse û helbestvan bi xwe jî wek mirov xwe dinivîse yan pitir helbestvanekî li ser bûyer û çemkên din dinivîse? Aya mirov bûye meremek ji bo nivîsînê, yan xesletek wî mirovî bi xwe bûye merem ne ku mirov tinê wek tak dûr ji çêbuna giyanê wî ka çewaye û çewa nîne? Mirov wek zîndewerek remzekî derbirînê ji meziniyahî û ciwanî û desthelata xwedayî pitiriya mirovan ewên ku bibêjin helbestvan helbest nivîsandin û mirov jî bûye pişkek ji wê nivîsînê, lî ta çi rada helbestvan bawerî bi nivîsîna mirovaniya mirovan û ta çi rade bo kakileka mirovayetê nivîsandiye?

Dema bo kiçê nivîsî aya bo mirovayetiya mirovanan (humanîzm) mirov wek pişkek ji civakê girêdayê zincîreka dirêje bi şêweyê çend xelekan ku hemû girêdayine yekem kultur dezgehên siyasî aborî perwerdeyî û hemû dezgehên dî û mirovî çi rol di sîstemê jiyana heyî de nîne û em hemû girêdayî wî serdemîne ewê tê de jiyan dikin, wek mirov cureha şêweyên çewisandinê me çi helbijartin nîne, şêwazê jiyana xwe tinê ya li ser wî ew e vê helbijêre yan yê dî helbijêre, renge eve ne tinê daxwaziyek be bo azadiyeka reha, nexêr ji ber azadî jî heger sinorên xwe nebe dê naxweş be, anku di nava azadiyê jî de ne azadî heye, Girîman feylesofeke derbarê azadiyê dibêje: "azadî ew nîne ew tiştê te bivê bikî, belku ew tu wê tiştî bikî ewa mirovî li gel xwedê wî tena dike, anku te bawerî pê hebe û namu û xerîb di nava xwe de nemîne, lê li vêre azadî bo helbestvanî çi wata dide, aya helbestvan azade dinivîsînin xweda? Aya yê azade di zimanê xweda û zor pirsîn dî

ko naveroka wan li ser azadiya nivîsînê û nivîsîn bo mirovatyê ta çend dihê kirin wek pirose û armanc. Diyar e helbestê ne bi tinê, belku hemû û barên dî jî girêdayî wî serdemîne yên tê de derbaz dibin pirs li ser nivîsîna helbestê bi xwe zor in, aya helbest dibe serçavekê bo têgehiştineka bi hêz bo hestên mirovî aya dişê zimanî xwedî mirovî rabigehînit?

Aya helbest dişê bibe takejêder bo naskirina helbestvanî û hind derbirînê ji fantaziya helbestvanî dike?

Helbest wek jî warên dî nîne nahête nivîsîn dû cara xwe dubare nake, zor cara dema reş nivîsekî dinivîsî, dibînî bo carê be ku te divê binivîsî tiştekî nû dinivîsî, helbest rasttirîn şêwe derbirîna mirovî ye, dema nivîsîna tiştek di nava xwe de diyar bike ew nivîsîna dibe pencerek xwendevan tê de xwedî helbestvanî dixwîne. Helbest, her çend e hindek helbest zû bi zû neşên rehendên cuda cuda bidenê, lê bi şêweyekî ji şêweyan her dibe xwendin li gor rewşenbîriya xwendevanî, helbest berî her tiştek be diviya nebe armanc bo hindek meremên taybet ne yên siyasî û ne yên ayînî û ne yên aborî û ne yên civakî û hîç ne bi tinê helbest bo ruhiyeta helbestî be nivîsîn, helbest wek mirovî hatiye bindestkirin û hatiye kirêtkirin û hatiye xizmetkirin û sivikî bi bûhayê helbestê hatiye kirin.

Helbestvan berî helbestvan be, mirove û girêdayî wî serdemî ye yê tê de dijî û helbest jî wek helbestvanê jiyanê bi serdemê helbestvanê dike, herdu girêdayî sîstema jiyana heyî ne. Li ser (demên tarîk) ku kenîsa serwera her tiştekî dikir û zelamên kenîsê xwe bi xwedanê her tiştî dizanî û qedra mirovan jî bi xwe dikire armancek û mirov di wî serdemî de girêdayî sîstemek ayînî û esmanî dibû bêyî mafê helbijartinê hebe, lewra helbestvan û helbest di vî serdemî de bibûne du kaîn jêk cuda, helbest dihat nivîsîn bo zelamînî û piyawetî û merdatiya zelamên kenîsê, bangawaziyek bû bo takekesiya xwedayî û gewherê însanî bi taybet helbestvanan hatibû koylekirin, helbestvan dema bi heza xwe nenivîse, tinê tiştên din li pist bin wek armanc dibe derwêşek û defê bo paşa û sultanan lêdin û zemînî xweş dike ku ew jî mirovatiya xwe ji dest dide. Ji ber dema helbestvan hîç bawerî bi nivîsînên xwe neyne, dibe kesekî winda di nav xweda û na helbest û na helbestvan dişên wesa bi azadî henase bikin. Lew dibînin di vî serdemî de helbestvanan bi xwe helbest nivîsîn wek karek wergirtibû û nedişiya wek helbestvan ji xwedê xwe nêzîk be, zor cara

helbest ji bo sergermkirina paşa û civata simayî jî dihate nivîsîn û helbestvan dibû xizmetkarekê rewşenbîr, lê wan serdema xwe qutkir bi rêka çend qonaxên mêjûyî dema herdu desthelatên asmanî û desthelata erdî jêk vebûn û yasayên ayînî rolî xwe yê caran nema ku eqil êdî bo take jêder bo mirovan û zelamên ayînî ew bûhayê caran ji dest da êdî neçe bo zemîneka baştir ku helbest û helbestvan hinaseka azada bi hev re bikêşin ji ber her dem dihatine jêk vekirin, dema bi xwe û heza xwe serê xwe bo wê desthelatê diçemand, lê ma heger helbestvan bo mirovî binivîse dê çewa bişê derbirînê ji wê mirovatiyê bike? Mirov bi xwe jî hindek caran dibe xwedan şîwazekê dirindane, taybet dema divê bibe takekes û her tiştekî bo xwe bike milk û eve diyar bû dema mirov heta şerekî li gel siruştî jî dike û berdewam hêzek mirovan palde ku siruştî bi xwe terxan bike û siruştî jî heta di nivîsînê jî de siruşt dibe palderek ku helbestvan bi rêka siruştî xwe nû bike û palderekî baş be, fantaziya dewlemend bike, helbesta klasîkî ya kurdî şiyaye vê rastiyê bigehîne me û zor helbest bo mirovan hatine nivîsîn, bi taybet bo regezê mê mîna Feqê Teyran, Cizîrî, Şêx Nuredînê Birîfkanî, her caran kiç di helbestan wek hêmayekek bo mêyekê nebû mirovekê wek mê hatiye cudakirin ji mirovayetiya wê, negotîne ruhiyeta te geşe, hindî bi dêmê geş nivîsîne, ne nivîsîne hindek meremên din li pişt hebûyine ji wane xirvekirina ciwankaryê, xulqiyeteka xwedayî ku mê duwem armanc şiqeka zelamînî ya helbestvanî bûye, helbest, lê viyan û şiq, dîsan ji nava mirovan derdikeve û dîsan jî kerb û şer jî ji heman mirovî derdikeve, lewma helbestvan diviya biraweste li hember ladana şeran di nava mirovî, lê nivîsîn bi xwe jî rengeke ji rengîn şiqê, madem ez dinivîsim û heme, anku min hemû xweş divên ji ber mirovdostiya helbestvana ne ji kesanên dine, eve yek e ji hestên helbestvan pê hest dike ku hoşiyariya wî pitir e û sozdartir e û pitir ew mirovdoste, hind nazike xemê ji weriyana belgekî dixwet û netewe her dem barekî giran bû bo xemên helbestvana, bo helbestvanên kurd, netewe bûye babetek ji wan babetên bo mirovayeta xwe êş û azar ser kêşayîn, ji ber kurdbûn. Wate bi çavê dijminî tawanbarî kurdbûn bibû jêder bo çewisandina netewekî û nirxî mirovan bi netewayetiya wan dihate helsengandin, ewa dibû cihê êş azara helbestvanan, çewa mirov wesa mirovan biçewisînin, erê mana mirovayetiyê çiye?

Kî ji helbestvanan şiyaye helbestekê bi şerê birakujyê binivîse û bibêje ev şere şerekî şaşe? Yan başiyek bû, em wek netewe, miletek bûyine girêday zincîreka berdiwam ji şer û xedir û çewisandinê hatine girêdan, vêca ji bilî çewisandina yasa ne fermî, ku eşîret hîç kêmtir nebûye ji desthelata kenîsê, ev şer û desthelatdarî ye û terxankirina mirovayetiya rewşenbîran û bi taybet helbestvanan, we kiriye têkeliyeka ne adîlane di navbera ciwanî û neciwanyê di ruha helbestvanî de dirust bibe? Her tiştê

ciwan di nava her texekê de kuştiye bi egerî dewrûberekî şerankî.

Çend em tijî şer û kerb bibin, du cara hind ji estetîk û ciwanyê dûr dibîn, çend helbestvan tijî xirur û taratyê be, hind şefafiyetê ji dest dide, li vêrê de helbest dibe tiştekî namu di nav xwe de ji ber armanc û mebest ne ew helbestîbe. Helbest xerîb xwe bibîne aya bêdengiya helbestê çi metirsî li ser jiyana mirovan dirust dike, bêdengî mebest ew xweladana helbestvanan ji nivîsînê û destberdan ji têkelkirina dike li duniya helbestê, li vêre bersivek kurt derbazbûn bê nivîsîn, bê helbest, wata bê ruhê û çalakî û xewn ji ber mirov bi rêka helbestê dibe derwêşek di hembêza duniya û şiqê û ciwaniyê de simayika dike ta radey nîrvaniya ji hiş diçe, bi van du lapera dibînim helbestvan û helbest na azadin û helbest li cem hindek helbestvanan bûye pirek xwe pî derbaz dike layê mebest û helbest berze kirine û helbest tinê bo destqutanê û sergermkirinê dinivîsînin û eve jî ne helbeste, belku gazîkirineke bo armancên diyar û her û eve wî çendê ra nagehîne ku ew helbest, ew helbestvanê di bêdengiya xwe de niqum dibe dergeha li ser xwe dadêxe û pê çênabe binivîse, zor caran helbest nivîsîn nexweşiyeka xweşe wa dike mirov neşê her xwe tuşî wê janê bike tenhayî û hestkirin, bi dewrûberên xwe, milmilanê li gel xwe û civakî û bûyerî, heyî ev bê layeniya helbestvanî radigehînin û tenhayî di xwedî xweda dibîneve, lewma dibînin helbestvan bi çi serdeman qayil nabe, ne ewa pitir divêt belku bûyeriyek mirovayetîtir dixwaze û her helbestvanek neşêt bûyerê biguhorît binivîsîna xwe serbixwey dihelbijêre û helbest ne wek hemû çemkên dine, helbestvan neşêt bibe siyasetmedar û ew siyasetmedar jî neşêt bibe helbestvan, helbestvanê mezinê elmanî Huldirîn got: "Siyasetmedar di dumahiya jiyana xwe de hest diken tiştên ciwan di nava wan de hene, lê ew qed nabene helbestvan." çinku ne siyaset cihê helbestê digire û helbest cihê siyasetê nagire, helbest nivîsîn bo hûmanîzmê û ta rastgoyî li gel helbestê bêdengî û nebûna helbestê wateya dûrbun ji reng û befir û baranê û dûrbûne ji werza û rengan û dahiyanin ji ber helbest heger gehişta kinarekî azad û azadane henasa kêşa din şêt azadina derbirînê bike, cîhana helbestî cîhaneka azade, lê nebûna azadiyeka riha, çewa em hatîne bin destkirin, helbest jî bindeste û hêvî dikim helbestên me êdî bo rastiya û mirovayetiyê bin da helbest rastgoya xwe ji dest nedin.

Jêder

- Netewe û hikayet-Rêbûwar Sêweylî

- Derçûn ji desthelata manan-Hoşeng Şêx Mihemed